# BULTENA ÇANDINIYÊ

- Rêjeya hilberîna çandiniyê di sala 2021’ê de li gorî sala borî di nav dexl û berhemên din ên giyayî de ji sedî 13,4 kêm bûye, di warê sebze ji 1,8 fêkî, vexwarin û nebatên biharatê de ji sedî 5,4 zêde bûye. Rêjeya hilberîna çandiniyê di sala 2021’an de di dexl û hilberên giyayên din de 61,7 milyon ton di sebzeyan de 31,8 milyon ton û di fêkî, vexwarin û nebatên biharatêbû 24,9 milyon ton.
- Rêjeya hilberîna çandiniyê di sala 2021’an de li gorî sala berê ji sedî 14,3 kêm bû û bû 31,9 milyon ton. Li gorî rêjeya hilberîna çandiniyê ya di sala 2021'an de li gorî sala borî gulberoj ji sedî 16,8 kêm bûye û bi giştî 2,4 milyon ton hatiye hilberandin. Hilberîna nokan ji sedî 24, 6 kêm bûye û 475 hezar ton hatiye hilberandin. Behrê şekir ji sedî 20,7 kêm bûye û 18,3 milyon ton hatiye hilberandin. Hilberîna genim ji sedî 13,9 kêm bûye û 17,7 milyon ton hatiye hilberandin. Her wiha hilberîna ceh ji sedî 30,7 û hilberîna tûtinê jî ji sedî 7,7 kêm bûne.
- Li gorî rêjeya hilberîna çandiniyê ya sala 2021'an, îsotên ku ava wan tê derxistin bi rêjeya 11,9 hatiye hilberandin û 1,45 mîlyon ton hatiye bi destxistin. Îspenax ji sedî 5,7 kêm bû û 220 hezar ton hat hilberandin. Firingî ji sedî 0,8 kêm bû û 13,1 mîlyon ton hat hilberandin û pîvazên hişk jî ji sedî 9,6 zêde bûn û 2,5 milyon ton hat hilberandin.
- 2021 tarımsal üretim miktarlarına göre bir önceki yıla kıyasla portakal %30,6 artışla 1,75 milyon ton, zeytin %32,1 artışla 1,75 milyon ton, üzüm %12,8 azalışla 3,67 milyon ton, çilek %22,4 artışla 670 bin ton olarak gerçekleşmiştir.
- Li gorî rêjeya hilberîna çandiniyê ya sala borî di sala 2021’ande rêjeya porteqalan ji sedî 30,6 zêde bûye û 1,75 milyon ton, zeytûn ji sedî 32,1 zêde bûye û 1,75 milyon ton hatiye hilberandin. Tirî bi rêjeya %12,8 kêm bûye 3,67 milyon ton û hilberîna xûtan (çîlek) ji sedî 0,4 zêde bûye û 670 hezar ton hatiye hilberandin.
- Li gor raporta Rêxistina Meteorolojiyê ya Cîhanê di sala 2021’an de belavbûna gazên serayê, asta deryayan, germahiya okyanûsan û asîdbûna deryayan gihîştiye asta rekorê.
- Li gorî raporê, guherîna avhewayê bi pêlên serma û germê, baranên zêde, lehî, ziwabûn, bahoza tropîkal û bahozên dijwar bandorê li cîhanê dike. Di raporê de her wiha tê gotin ku germahiya global û guherîna avhewayê wê kêmbûna erzaq û avê, kêmbûna îstîhdamê, koçberî, nehevsengiya ekosîstemê, zirara binesaziyê, jiyanek nebaş û kêmbûna standarda jiyanê bi xwe re bîne.
- Dema ku baran li gor normalên demsalî têrê nake, ji bo hilberîna çandiniyê di mehên çaverêkirî de barîna ku tê pêşbînîkirin pêk nayê. Di hin salan de di demsala zivistanê de berf nabare carna jî zêde dibare. Ev rewş bandoreke neyînî li ser cotkaran dike.
- Bi hatina gel hev ya kesên ku çandiniya çay, nok, hejîr, zeytûn, titûn û hwd., li nav erdên xwe dikin, karkerên demsalî, karkerên koçber ên ku di çandiniyê de dixebitin û cotkaran Tarim Sen avakirin.

- Li Tirkiyeyê salane 1,45 milyon ton çay tê hilberandin. Ji ber guherîna avhewayê berhema ku berê 1,743 kg/da bû, di salên dawî de bû 1,708 kg/da. Çaya ku berê çar versiyonên wê bû, niha bi 3 versîyonan jî nayê kirîn. Rîze ji guherîna avhewayê zêde bandor dibe û ziwabûn di asta herî jor de ye. Rêjeya barîna şiliyê îsal li gorî sala borî ji sedî 58 kêm bûye û li gorî pisporan dê di 30 salên pêş de dêhilberîna çay neyê kirin. Qada hilberînê ya ku 762 hezar dekar bû, di salên dawî de ji be çandiniyê derket 849 hezar dekarî. Her çiqas qada hilberînê zêde bibe jî hilberîna her cotkar gav bi gav kêm dibe.
- Şîrketên ku di sala 2021'an de ji sektora xurekê herî zêde qazancê ragihandin Yayla Gîda 790 milyon û 467 hezar TL, TAT Gîda 228 milyon û 8 hezar TL, Kutahya Şeker 10 milyon û 566 hezar TL Pinar Gıda 133 milyon û 986 hezar TL, Kent. 131 mîlyon 74 hezar TL, Frigo Retail 57 mîlyon 425 hezar TL, Pîşesaziya EKIZ 42 mîlyon 437 hezar TL Oylum Food 17 mîlyon 901 hezar TL.
- Li gorî daneyên Saziya Statîstîkê ya Tirkiyeyê (TUÎK) hilberîna şîr û berhemên şîr li gorî daneyên meha îlonê yên sala 2022'an de salane ji sedî 4,4 û di sala 2022'yan de jî ji sedî 2,7 kêm bûye. Di meha Îlonê de li gorî heman meha sala borî hilberîna rûnê nîvîşk ji sedî 12,8, hilberîna mast ji sedî 6,2 û şîrê vexwarinê jî ji sedî 1,7 zêde bûye; hilberîna dew ji sedî 4,8 kêm bûye û hilberîna penirê çêlekan jî ji sedî 1,6 kêm bûye.
- Li gorî daneyên Saziya Statîstîkê ya Tirkiyeyê (TUÎK) endeksa bihayê hilberandina herhemên çandiniyê yên meha cotmehê mehê ji sedî 4,59 zêde bûye, li gorî salê ji sedî 163,32 zêde bûye. Di endeksê de li gor meha kanûnê ya sala borî ji sedî 123,81 û li gor navîna donzdeh mehan jî ji sedî 111,12 zêde bûye.
- Li gorî rapora Navenda Lêkolînê ya Sendîkaya Karkeran a Buroyê (BES_AR), di meha cotmehê de sînorê xizaniyê gihîştiye 27 hezar û 920 lîreyan. Her çend di malbatek çar kesan de her kesek bi mûçeya herî kêm bixebite jî mûçeyên wan di bin sînorê xizaniyê de dimîne. Li gorî hesabên BES-AR'ê yên li ser bihayên xwarinê, lêçûnên mehane yên ji bo xwarina tendurist a malbateke 4 kesî ya meha cotmehê derketiye 8 hezar û 570 lîreyî.
- Li gorî lêkolîna Sînorê Birçîbûn û Xizaniyê ya Mijdara 2022'an ku ji aliyê Turk-Îşê ve tê amadekirin, lêçûna herî kêm a lêçûna malbateke ji 4 kesî ya li Enqereyê ya ji bo "xwarinê" tê xwestin li gorî meha borî ji sedî 4,87 bûye. Sînorê birçîbûnê bûye 7 hezar û 785 lîre, sînorê xizaniyê jî bûye 25 hezar û 365 lîre. Sînorê birçîbûnê bi qasî 2 hezar û 285 lîreyî ji heqdesta asgarî derbas kir.
- Li gorî daneyên Komeleya Hemû Karsaz û Pîşesazên Çerezê (TUKSÎAD) kîloya findiqê bûye 200-250 TL, findiqa bi qalik bûye 100 TL, fistiqa Dîlokê bûye 250-350 TL, beîva kal bûye 300 TL. Li dikanan bihayê kakilê gûzê 250-300 TL ye, gûzên biqaçil jî di navbera 70-80 TL'yî de ne. Firotina gûzên hişk li gorî sala borî ji sedî %30 kêm bûye ji ber kêmbûna daxwaziya xerîdaran ku hêza kirîna wan kêm bûye ji ber zêdebûna nirxê gûzên hişk di sala borî de gihîştiye rêjeya ji sedî %100.
- Saziya Statîstîkê ya Tirkiyeyê (TUÎK) di îlona 2022'yan da Endeksa Bihayê Ketina Çandiniyê salane ji sedî 138,15 û mehane jî ji sedî 2,90 zêde bûye. Bihaya salane ya herî zêde gubre ji sedî 226,63 zêde bûye û herî zêde jî bihayê mehane ji sedî 19,71 li ser tov û madeyên çandiniyê bûye. Li ser bingeha salane kelûpelên din ji rêzê ve enerjî bûye ji sedî %194, lêçûnên lênihêrîna avahiyan ji sedî %160, êmê sewalan ji sedî %146 û dermanên çandiniyê ji sedî %111 zêde bûn.
- Ofisa Berhemên Axê (TMO) ji bo kirîna 455 hezar ton genimê nan îhaleya navneteweyî vekir. Tê pêşbînîkirin ku di navbera 7'ê kanûnê û 9'ê çileyê de 195 hezar ton ji 455 hezar ton derhanîn were kirin. Di vê partiyê de wê 25 ton ji bendergeha Bandirma, 20 hezar ton ji bendergeha Trabzonê û 50 hezar ton ji bendergehên Îzmîr, Tekîrdag û Samsûnê bên kirin.

- Tê armanckirin ku radestkirina partiya 260 hezar tonî di navbera 6'ê çile û 17'ê sibatê de bê kirin. Radestkirina vê partiyê wê bi qasî 10 hezar ton ji bendergeha Trabzonê, ji bendergehên Derînce, Îskenderûn, Mêrsîn, Îzmîr, Bandirma û Karasûyê cuda cuda 25 hezar ton û ji bendergehên Tekîrdag û Samsûnê jî 50 ton bê kirin.
- Li gorî daneyên IMF'ê yên Banka Cîhanê, Tirkiye di rêza 4'emîn de ye ku enflasyona xwarinê ya herî zêde ji sedî %99 e. Bi rêjeya ji sedî %321 yekem Zimbabwe, bi rêjeya ji sedî %208 duyemîn Lubnan û bi rêjeyan ji sedî %158 jî sêyemîn Venezûela bû.
- Li gor daneyên TUÎK’ê, Tirkiyeyê di 10 mehên ewil ên sala 2022’an de 3720 hebin vala û 14 hezar û 813 hebin tije bi tevahî 18 hezar û 533 hebderhanîn kiriye. Di 10 mehên ewil ên sala 2022’an de bi tevahî 37,2 milyon dolar ji bo derhanînê hatiye dayîn.
- Endeksa bihaya xwarinê ya cîhanî ku ji hêla Rêxistina Xurek û Çandiniyê ya Neteweyên Yekbûyî (FAO) ve tê amadekirin di mijdarê de ji sedî 0,15 daket û ket asta herî nizm ji meha çileyê ve; li ser bingeha salane ji sedî 0,3 zêde bû.
- Li gorî daneyên TUÎK’ê enflasyon di meha mijdarê de li gorî meha borî ji sedî 2,88 û li gorî heman meha sala borî ji sedî 84,39 bû.